

## Mirovê resen ew e yê li destpêkê tiştê xwe bizanibe



*Peyvandin:* Loqman Asîhî

**H**er tişt ava dibe, lê peyva avabûnê tenê ji bo rojê û yên weka wê dihê gotin. Wê rojê ez pîrî moral bûm, li devê deriyê wî rawestiyam û min wêneyekî taybet ji bo wî di xeyala xwe de dirust kir. Raste seyda di nava bajêrê xwe de xwedan nave, lê belku qusûr ji min bûye ku wêneyê wî bi awayekî şaş di mêjiyê min de hatiye dirustkirin. Weka her rojnamevanekî peyt, min denggir û kamîra xwe bi milê xwe ve kiribûn. Bi jûr ketim û çavê min bi rewşa wî ket: "xwezka bi vî awayî çavê min bi we ne ketiba ". Axir eve ye dinya, lewa peyva duhî, evro û sube heye. Dirêj nakim, lê tenê dibêjim agir di qurman de dimîne.

**Asîhî:** Findî anku çi û ji kîve hatiye?

**Kerîm Findî:** Findî navê babê min e, navê min "Ebdulkerîm Findî yehiya Ehmed Findî "ye, anku navê babê min e û yê bapîrê min yê çarê ye. "Findî "wek peyv ji peyva "find "hatiye û bi ramana "şemalik "dihê, anku ronahî bi zimanê kurdî.

**Asîhî:** Nasnavî çend kartêkirin li ser avakirin û dirustkirina kesanên navdar heye?

**Kerîm Findî:** Nasnavî karekê baş yê hey, lê mirov nasinava dirustdke, her weku babê min hindek "beytên kurdî "ji ber kiribûn û digotin, wî demî radyo û telefzyon dikêm bûn. Babê min çîroka "Bozê Reş-Hespê Reş "û "Xanê Lepzêrîn "û "Sîtî û Ferx "û gelekên dî ji ber kiribûn û bo me digotin. Vê çendê kartêkirina xwe li ser min

hebû. Raman ji vê gotinê ew e ku bab û bapîra kartêkirinê li mirovî dike, lê belê divêt mirov jî xwedan şiyana be. Hez li edebiyata hebe, Heger mirovî behre nebe, bila babê mirovî çend xwedan şiyana be, mirov nikare bibe xwedan behre yan nivîser.... Eve di warê nivîsîn û edebiyatê de û bi vî rengî di her warekê din jî de.

**Asîhî:** Kesê ji binemala Findî hewl nedaye ku bêy sîwaneya Findî derbazî meydana edebî û navûdengiyê bibe?

**Kerîm Findî:** Ez pê nizanîm, ji binemala Findî kes bêy ev sîwaneyê çû bîte di nav xana edebî û nav û dengiyê de. Her weku diyar.... Ez û birayên xwe Reşîd û zet kurên min Salar û Hekar, birazayên min Emîr û Heval.... Ev seywaneyê bi xwe ve hilgirtî û ketîne di nav vê meydana de.

**Asîhî:** Seyda Kerîm Findî di nav binemala Findî de weku edîbek xwe li pileya çend dibîne?

**Kerîm Findî:** Li pileya yekê tîm, ji layê edebiyata ve jî dîsa ez li pileya yekê tîm wek destpêkirin, min beriya hemûyan dest bi vî karî kiriye û ketîme di nav vî warî de ku bo yekemîn car berhemê min li sala 1968-ê di kovara Kurdistan de hatiye belavkirin ku organê liqê yekê Partî Dêmokirati Kurdistan bû, min di vê kovarê de karikiriye. Paşî berhemên min li sala 1971-ê di rojnama Hawkarî de hatîne belavkirin. Lê ji layê babet û şiyana û naveroka nivîsaran ve, tu dikarî ji xwendevanan bipirsî.

**Asîhî:** Eger niho bibêjine te dîrokê paş de vegeerîne tu dê li kê derê rawestîni ku tu bi demê xwe yê zêrîn didanî?

**Kerîm Findî:** Ji layê rewşenbîryê ve ger dîrokê paş de vegeerînim dê vegeerînim salên nota ji çerxê borî ku di wan salan de min pitir berhem çap kiriye ku wan berhemên rûyê xwe yê mêjûy û roşinbîrî hebû. Her wesa li ser demê ez rêveberê giştîyê rewşenbîrî û hunerî, me şiya du mezintirîn fîstevalên roşinbîrî li deverê bigêrîn, ew jî "Fîstevala Xanî û Cizîrî" bûn ku rolê min di wan her du fîstevalan de rolekê serekî û giring bû... Me şiya bi serkeftiyane wan fîstevalan bigêrîn, zêdebarî çend çalakîyên di wekî fîstevala "Nalbend, Mehwî, Şakir Fetah! û gelekên din.... Anku li wî demê min gelek çalakî û bizav encamp dane.

**Asîhî:** Projeyekî rewşenbîrî di serê te de hebûye û ji ber hindê egeran bi cih-ne hatî?

**Kerîm Findî:** Belê, gelek tiştên mezin di serê min de bûn, wek melbendekê Kurdolojî li Duhokê bihête damezirandin ku min hewla danana wê jî dikir, lê mixabin bi cih nehat. Evca çî ji layê roşinbîrî ve ew berheviye nebû yan hukimeta herêmê nedivîya vî tiştî pêk bihîne ji ber ku da kêmasî tê de hebin, yan jî hindê tiştên di hebûn.... Her wesa min li ber bû çend pertûkan çap bikim û destnivîsên hindê ji wan bi dûmahî hatîne û yên li cem min û hindêkên di jî ber bi



dûmahiyê ve çûne û ji ber nexweşiya xwe min di cih de rawestandîne û mane bi rê ve, yek ji wan "Mêjûya Behdînan" û yeka di bi zimanê erebî li dor "Nexşeya Siyasiya Îraqî" bû û çend projeyên din.....

**Asîhî:** Dihête gotin ku tu edîbek bûy û îdariyekî baş, tu şanaziyê pitir bi kîjan layî dikî?

**Kerîm Findî:** Îdare hunere... Her wesa weke xasletek yan paşnavêk (nasnavêk) bi mirovî ve dimîne, ka çewa dibêjin filan kes nojdarekê başe, endazyarekê başe, nivîserekê başe, her wesa dibêjin îdariyekê başe û td. Demê min layê îdarê û roşinbîriyê girtî... Îdara min jî her peywendî bi roşinbîryê ve hebû, evca çî li demê ez li Yeketiya Nivîseran yan warê perwerdê yan jî demê ez li wezaretê roşinbîrî, min îdareka baş dikir her girêdan bi roşinbîriyê ve hebû.... Evca min di layê îdarê û roşinbîriyê de serkeftin bi dest xist.

Ez şanaziyê bi îdarê dikim, lê Heger mirov îdariyekê baş be, bê guman roşinbîrekê başe û her wesa berûvajî jî, ji ber îdare pêdivî bi roşinbîryê û li dawiyê şanaziyê bi her du laya dikim.

**Asîhî:** Li rojên 12-13/7/1996 paş du sêminaran ku hewe û mamosta Muhsin Qoçanî pêşkêşkirîna sexmerat bi werarêxistina roşinbîriya kurdî, 16 rasparde hatin hilbijartin da ku bibine bername bo paşerojeka nêzîk, lê ya ji min ve pitirîya wan raspardeyan bicih nehatin, bo nimûne weku damezirandina melbendekê Kurdolojî li Duhokê, dest bi wergêran û çapkirina pirtûkan, alîkariya wan kesan bihête kirin ewên fulklorî kom dikin yan ferhengên didanin û hêjên din.. Çima bicih ne hatin?

**Kerîm Findî:** Heger hûn pirsra min dikin (kanê ew rasparde bo bi cih nehatin?) ez jî wesa wê pirsê ji cihên berpîrs dikim! Ji bîr neke me rasparde yê pêşkêşkirîna, ne ku rasparde ketîne ber destê me ku em cihê bicihînanê bûn! Ew rasparde bo hukmetê hatine pêşkêşkirin, her çende bo hukmetê bi sanahî bûn ku bi cih bihînin, lê wesa diyare ji ber kawdanên siyasî yê wî demê Kurdistan tê de diborî bibû yek ji egerên ne bicihatina wan raspardeyan, her wesa dibe bi egerê nebûna zana û roşinbîrên xwedan şiyar û xwedan bawernameyên

baş û pisor ev jî bûye egerê ne bi cihatina wan raspardeyan. Pêdivî bû heger çî bi cih nehatibane, diviya li dor "bingehê Kurdolojî" her bi cih hatiba, ji ber pişka zimanê kurdî li zankoya Duhok nabe alternetîv bo vî bingehî. Wek me gotî dibe eve hindê eger bin, lê her nabine behane bo bi cih neynanê.... Sebaret wergêranê, ez bi bawerim ger di wan salan de dest bi wergêrana jêderan hatiba kirin, ta evro ew asteng û kêmasiyên dikevne hember xwendevanê kurdî de care bin, yan gelek ji wan nediman.

**Asîhî:** Tu edebê û siyasetê çend dûr yan nêzîkî yek dibînî?

**Kerîm Findî:** Ew bi xwe du babetên jêk cudane, bes li Rojhilata Navîn li nîva çerxê bîstê yên li nav yek hîlbûn û em kurd jî yek ji milletên rojhilata navînîn, ev kare yê li me hatiye kirin ta radeyekê diyar. Zorbey siyasiya tişt dinivîsî, evca çî pertûk bin yan gotar, û endamên Yeketiya nivîsera bûn, lê di van salên dawiyê de siyaset pîçekê ya ji edebî cuda dibe.

**Asîhî:** Rewşenbîrekî kurd dibêje, "rewşenbîriyet bi çî rengan nabe şûlker di xanyê siyasetê ve, çunku gelek ji wê yekê mezintire".. Tu bo vê yekê çî dibêjî, nexasme ku gelek ji rewşenbîrên kurd niho di siyasetê de kar dikin û belku hûn jî yek ji wan bûne?

**Kerîm Findî:** Ez nabînim rewşenbîrî mezintire ji siyasetê, çunke her yek babetekê serbixweye û her yek ya giring û pêdiviye di cihê xwe de. Û pêdiviye mirov her babetekî cuda bike ji yê dîtir her yekî ne bes siyasiyet û edeb, belku hemû babetên dî serbixwe û giringiya xwe heye û mala xwe ya cuda heye û tê de serbixweye. Karkirin di xana siyasetê de yek bû milletê kurd ketiye tê de di vî çerxî de û kurda divê xanê de bizav û werar kir ta gehiştî ye radeyeka baş. Evro millet yê bi zimanê kurdî dinivîsin û dixwînin û diaxivtin ku ew jî berhemê vê werarê bû, lê di jiyê min de me zimanekê dîtir ne yê kurdî dixwand û dinivîsî. Derbarey karkirina rewşenbîrî di xana siyasetê de sereray serbixweya van biyavan giring dibînim ji ber ku girêdaneka giring û mukim heye, bi kêmasî derbarey xemxwerî û parastina kulturê milletî... Lewa ez dibînim bi vê egerê rewşenbîr ketiye di xana siyasetê de.

**Asîhî:** Beriya çend salan tu di simînareka xwe de dibêjî: "geşbûna rewşa rewşenbîrî girêdaneka mukim bi rewşa siyasî ve heye, pêk ve geşbûne û dakeftîne. ".. Ez dipirsim kîjan li pey ya din bûye û kîjanê kar li ya din kiriye?

**Kerîm Findî:** Siyaseta kurdî ya hevçerx werara daye rewşenbîriya kurdî jî, lewa rewşenbîrî digel siyasetê bi rê ve diçe û yek ji armancên siyasetê geşepêdane bi ziman û edebê kurdî û li hemû kongre û kombûnên siyasî rewşenbîriya kurdî nehatiye ji bîr kirin, belku yek ji binwaşên siyaseta kurdî bûye. Lewa demê siyaseta kurdî xurt dibe, rewşenbîriya kurdî jî wekî wê xurt dibe. Ez wisa têdigezim û bizavê

bo dikim.

**Asîhî:** Tu çawa berê xwe didî bizava wergêranê li devera Duhokê?

**Kerîm Findî:** Wergêran hunerekê serbixweye.... Pêdiviyê ew kesê wergêranê bike du zimanan baş bizanibe û şarezayiyeka baş tê de hebe, me ev mirove, anku wergêre kêm yên heyin û ji ber hindê wergêrana me ya lawaze. Demê berhemek ji erebî têtê wergêran, yê lawaze nemaze ger ji zimanekê wekî îngilîzî yan rûsî.. Û td be evca dê bi çi reng be. Li Hewlêr û Silêmanyê bi sedan berhemên wergêray bo zimanê kurdî hene, berûvajî Duhokê ku em bi dehan berheman jî nabînin. Li van salên dûmahiyê wergêran ji zimanê farisî dihête kirin, lê wan li astê pêdivî nabînim, ji ber ku ew wergêr ne derçûyên çî ekadîmiyanin, ta wergêrana wan ya di cihê xwe de be, evca çî ji layê naverokê ve be yan wergêranê ve, yan her layenekê din. Bi dîtina min em pêdivî wergêranê ne ji zimanên zengîn û zîndî ku ji bo me bibine jêder ne ku tenê wergêrana çîrok û ramanan.... Û td, anku di biyavê rewşenbîryê de belku fere di hemû biyavan de wergêran bihête kirin.



**Asîhî:** Rewşenbîrekî kurd dibêje: "her çandeka xwe ji çandên de vedize û xwe di kunca xwe ve asê bike, ew hem dê paşkeve û hem dê di leşê xwe bi xwe çert û hem dê pûç be jî, lewa wergêran ji bo têrûteselkirin û persendina kulturê netewî gelek pêwîste". Yekê din dibêje: "me kurdan pêwîstî bi wergêranê nîne" başe seyda Kerîm Findî çî dibêje?

**Kerîm Findî:** Ez dibêjim me pêdiviyatî bi wergêranê heye, lê weku min berî nuke gotî me wergerên baş û pispor û şareza kême hene, belku her nînin. Ji ber hindê dibînim fere hindek ji rewşenbîrên me zimanên biyanî hîn bibin û tê de şareza bibin evca çî li wan welatan bijîn yan ewên li wan dijîn da ku bi şewazekê ekadîmî fêrî zimanê wan bibin û hey û neyî wan zimanan bizanin da di wergêranê de serkeftî bin. Lê wekî din bi rêya ferhengan wergêran nahête kirin. Ger berhem bi rêya ferheng û zanîneka sade ya zimanî bihête wergêran çî tama edebî yan mîfayê zanistî tê de namîne.

**Asîhî:** Di gel wê çendê ku tu edîbî, tu mamostayê zimanê îngilîzyê jî, tu nabînî ku te ta radeyeka mezin xemsarî kiriye di aliyê wergêranê de û bi taybetî ji kurdî bo îngilîzî?

**Kerîm Findî:** Raste ez mamostayê zimanê îngilîzî me, lê heger min berhemekê kurdî kiribaye îngilîzî da çend kesên kême bixwînin, bi taybet li demê berî serhildanê û dibû rêk jî lê hatiba girtin ji layê desthelata wî demî ve, lewa min ev kare neda ber xwe. Lê piştî serhildanê sereray mijûliya min ya bi karê îdarê ve min berhemek li dor "hozên kurdî li bakûrê wîlayeta Mûsil" ji zimanê îngilîzî wergêraye ser zimanê kurdî û çapkiriye, her wesa bi hevkarî digel mamosta Metî Filîbis me berhemekê din jî ji zimanê îngilîzî wergêraye ser zimanê kurdî ku li dor "Rêzimana devera Duhokê" bû, ev berheme yê hakimê siyasî "çaldîn" î bû ku li sala 1919 hakimê siyasî yê Duhokê bû.

Bi dîtina min ya girîngtir ew e ku mirov ji zimanên biyanî berhemana wergere ser zimanê kurdî ku pitir mîfa dê jê bihête wergirtin ji layê xwendevanê kurdî ve ji wê çendê ku berhemekê kurdî wergêrîne ser zimanekê biyanî.

**Asîhî:** Gelek caran dihête gotin Duhok anku edeb û ciwanî û şîr, tu çawa bizava rewşenbîrî û hunerî li van salên dawiyê li Duhokê dinirxînî?

**Kerîm Findî:** Bizava rewşenbîrî li Duhokê baş dibînim, lê ne li pey rewşa van du sê salan ku bi rastî ya ber bi paş ve dihêt. Bizava rewşenbîrî bê guman di van bîst salên dawiyê de rewşeka din wergirtiye ku rêja weşana çî kovar û rojname bin yan pertûk bin zêdebûna bi xwe ve dîtî û eve jî tiştê başe. Belê mixabin di van salên dawiyê de jimara daneyên çap dibin gelek ya kême, vêca her em behsê firotina yan xwendina wan berhemana nekîn baştire, ji ber ku xwendevan û bi taybet xwendevanê kirmancî gelek kême bûye, bo nimûne berahiyê 2000 -3000 dane çap dibûn lê nuke 300 -500 dana çap dibin!

**Asîhî:** Hebûna çend binkeyên rewşenbîrî li devera Duhokê, çend şiyane bibine rûyê rewşenbîrî bo deverê û şiyane çî zêde bikin, û pêdivîbûna hebûn ya nebûna wan bi dîtina te çende?

**Kerîm Findî:** Tiştêkê gelek başe binkeyên rewşenbîrî li bajêran vebin ji bo bi hêzkirina zanîn û rewşenbîriyê, lê mixabin hindêk binkeyên rewşenbîrî merem û erkê xwe dayine layekî û pişt guh havêtîne wimerem wimebestêt xwe yêt kesukî înayne pêş winanekî pê dixun. Her çend e hebûna wan baştir e ji nebûna wan lê fere ew erkê xwe bizanin. Pîdiviyê senterên rewşenbîrî rûyê wê deverê bi rûn û aşikirayî diyarbken, anku her tiştê girêday wê deverê yê rewşenbîrî, fulklorî, dab û nerîtan... Û td, li berçav bikin û di kovar û rojname û pertukan de çap bikin hem dê nîşanî xelkekî bikin, hem diparêzin, ya giring parastina kulturî ye.

**Asîhî:** Çaxê zîrîne Yeketiya Nivîseran-Duhok kengî bû? Ji bo çi?

**Kerîm Findî:** Her kesek çaxê xwe dikete çaxê zêrîn, lewa ez neşem bersiveka vebir bidem, lê sereray hindê ez dibêjim çaxê zêrîne Yeketiya NivîseranDuhok salên heştêya bû, ne ji ber ku mişe pertûk çap dibûn, belku şiya Duhokê di wî çaxî da li ser pênxwe rawestînit û zimanê kurdî û zarê kirmancî belave bike. Yeketiya nivîseranDuhok di wî demî da yekemîn dezgeh bû ku kirmancî belave dikir û diparast û kor û simînar digêran, lê heger di wî çaxî de Yeketiya nivîseranDuhok helweşiyaba, kesekê nediwêriya pertûkeka kirmancî çap bike, yan gotareka kirmancî belave bike, bivî rengî da rewşenbîriya kurdî û hesta netewayetî li deverê de dimire.

**Asîhî:** Karê Yeketiya NivîseranDuhok li van salên dawiyê tu çawa dibînî?

**Kerîm Findî:** Jimara endama ya pitir lê hatî, lê gelek ji wan kirmancî nanivîsin, mebesta min tama kirmancî jê nahêt û babetên kirmancî nînin, ji ber hindê ez dibînim heger bizivirine babetên kirmancî baştire ji yên biyanî, lê diyare babetên kirmancî lê geriyan û zehmet pitira tê de hey ji babetên dîtir, tinê çîrok nebe. Ji layê îdarê ve kongre dihêne gêran, simînar dihêne berhevkirin, lê mixabin hindî berê xelk naçîne guhdanê û ew simînarên dihêne berhevkirin, bi hizra min, lawazin ku nahêne berawirdkirin digel yên berê, Yeketiya Nivîseran baregehekê baştir heye, kovareka berdewam heye, şiyânên baştir hene, belê wekî berê seng û şewqa xwe nemaye.

**Asîhî:** Ji bo çî tu û ev edîben hevjiyê te



xwe berbîjar nakin di Yekêtiya Nivîseran de, erê hûn xwe ji astê Yekêtiyê mezintir dibînin, yan jî delîva gencan pitir bûye?

**Kerîm Findî:** Ez sebarek xwe diaxivim, ta sala 1993-ê jî ez di kargêriya desteka rêveber de bûm, di wê salê da min postekê îdarî rewşenbîrî li wezaretê rewşenbîriya hukmeta herêma Kurdistanê de wergirt, anku bûme rêveberê giştîyê rewşenbîriyê û hunerî li herêma û ta niho jî ez her rêveberê giştî me li wezaretê, ji ber vê yekê min dest ji kargêriya desteka rêveber berde û min waz li Yekêtiya Nivîseran hîna ji layê îdarî ve ne ku ji layekê dî ve ku her dem ez nêzîkî wan bûm û bi rêya postê xwe min alîkariya Yekêtiya Nivîseran jî kiriye... Tinê di van du sê salên dawiyê de ez ji wan dûr ketîme ew jî bi egerê nexweşiyê. Her wesa bi hizra min mirov delîvê bide wî xelkî ewê piştî mirovî dihên ne xirabe, eve jî egerêk bû ku min delîve dabe hindêkên dî ku bibine endam di desteka rêveber de.

**Asîhî:** Gelek caran dihête gotin ku tiştê gencên evro dinivîsin pitir tama lasaykirin û kopîkirinê ji azmûna rojava jê dihêt û tiştê cîlê kevin dinivîsî pitir tama resenayetiye jê dihêt. Hûn çî dibêjin?

**Kerîm Findî:** Ez dibêjim ev gotin di cihê xwe de ye, Heger em li wî berhemê kurdî binêrîn ewê di salên heftê û heştê û notan de dihate nivîsîn, piraniyê tama kurdîniyê jê dihat, hemû kurdî bû û bi kurdîniyê dihate nivîsin û gotin, lewma dibêjnê rewşenbîriya kurdî. Belê evên li salên du hizarê û hêr ve pitir wergêran û vecwîna hizir û bîrên ne kurdîne... Lewma vê gavê em dişên bibêjin ku rewşenbîriya kurdî ya di qeyranekê de dijî. Lewa li vê derê daxwazê ji nivîserên kurd dikim ku li xwe bizivirin û tiştê kurdî binivîsin da xelkê me têhnatiya xwe bi wê kurdîniyê bişkêne.

**Asîhî:** Ma xwe girêdan bi resenayetyê ve ne anku çerîn dipîstê xwe de û mirineka hêdî hêdî?

**Kerîm Findî:** Girêdan bi resenatiyê ve ne mirineka hêdî hêdî ye, ez dibêjim mirov yê resen be baştîre ji yê berela be... Mirovê resen ew e yê li destpêkî tiştê xwe bizane û binivîse paşî tiştê xelkekê dîtir jî bizane û mifay jê wergire, wesa rewşenbîrî dewlemend dibe û werarê dike û digehe astekê baştir, ne ku mirov rewşenbîriya xwe ya neteweyî ji bîr bike û rewşenbîriyeka dî wergire. Ez dibêjim li wî çaxî mirov di nava herduyan de berze dibe. Rewşenbîriya biyanî mirov çend lê şareza bibe nagehe xwedanê wê rewşenbîriyê û wî zimanî û di ser vê yekê re jî mirov rewşenbîriya xwe jî nezane eve mirov li kî ve rast vebû?. Lewa fere mirov bi rewşenbîriya milletê xwe bizane hemû êş û jan û kêf û xweşiyên wê zêdebarî rewşenbîriya biyanî jî bizane.

**Asîhî:** Erê di wextekî de te dihê înader ku sereray wê çendê ku hûn ta jîmareya 10 ya Peyvê li gel desteka nivîseran bûn, lê weku nivîsîn ji bilî jîmareyên 1 û 2 ji Peyvê wekî dî min çî nivîsînên te tê de nedîtin.



Ma bi dîtina te ne yek ji mercên wî kesê ku navê wî edîb diviya ta radeyeka baş di warê nivîsînê de çespan be?

**Kerîm Findî:** Gelek biyav û dergehên dîtir li ber min vekirî bûn ji bo nivîsînê... Bo nimûne li wî demî min li kovara "Metîn" zincîreka dîrokî li dor "Şoreşa îlonê" her meh dinivîsî û belave dikir, zêdebarî nivîsînê di hindek kovar û rojnameyên dî de... Lewa min bi fer dît delîvê di kovara "Peyv" de bidime hindek nivîserên dîtir.... Ji ber vê yekê ez yê kê m berhem bûm di vê kovarê de.

**Asîhî:** Hızırvanê kurd Mesuwid Mihemed dibêje: "eger nûser bimirê demrê, eger le nosîn kewit demrê, eger xwî sok kird demrê, eger ray xoy bifiroşê demrê, eger du rûyî kird demrê, xo eger le yekê lemaneda, cike lehaletî yekem, nemird, debê xwîneran bimirênin, dena be xoyan demirin." bi dîtina seyda Kerîm Findî nivîser kengî dimire?

**Kerîm Findî:** Nivîser bi hizra min heger digel milletê xwe nebe, nivîsînên wî mirîne di nav milletî de, dem û berhemê nivîserî divêt pitir digel milletê wî be. Heger ne, dê bimore. Bi kurtî dibêjim heger nivîserî xwe sivik kir yan hizir û dîtînen xwe firotin yan durûyatî kir dê bimore. Ew nivîserê digel milletê xwe be her dem saxin û namirin... Weke Cizîrî û Xanî... Û htd ku her şîr û pertûkên wan ta evro jî dihêne xwendin û li karin û saxin di nav dilê milletê xwe de dijîn çunku bo milletê xwe nivîsibûn.

**Asîhî:** Çend li gel wê boçûnêyî ewa dibêje: Nivîserên ku bo demekê dûr ji nivîsînê rawestiyayin û stewr bûn, pêdiviyê Yekêtiya Nivîseran muxelkirinekê di derheq wan de bike?

**Kerîm Findî:** Ew endamên salên heftêyan ji nivîsînê westiyayîn, endamên Yeketiya Nivîseranin, belê bi hizra min bila mafê dengdanê nebe. Nivîser her nivîsere, çi endamê Yeketiye be yan ne endam be. Hindek nivîserên heyin bo demekê kurt nivîserin û nivîsînên wan dimînnin pir biha û bi nirx. Evca çi endamên Yeketyê bin yan ne. Li Duhokê hindek hatine wergirtin wek endam li salên heftêyan ku nivîsînên wan dikêm bûn yan nebûn ev çend e jî bi egerê dirustbûna hijmara nivîsera de bû ku liqek li Duhokê vebe û bibe yek ji liqên Yeketiya Nivîseran, li dor vê çendê jî Yeketiya giştî rê xweş kiribû.

**Asîhî:** Heger kurdîniyê şîrê dujminan li hindav serî be û nehêla be werarê bike, xwedê wekîl du şûr li hindavî kurmancî bûn, yek yê dijminan û yê dî yê navxweyî û yê navxweyî hemû dema wêrantir û zalimtir bû" ev gotin ya rewşenbîrekî Duhokê ye. Ez ji te dipirsim: Ma bi dîtina te raste li wê radê zorî li ser zarê kirmancî heye?

**Kerîm Findî:** Zarê kirmancî zarekê serekiye yê zimanê kurdî, kes neşê vî tiştî ji bîra xwe bibe û înkâr bike, lewa heger yek mêjûyê bizivîrîne bo salên heftê û berî wê kirmancî nedihate xwendin li

xwendîngehan, belê kirmanciyê werar kir li devera Behdînan û cihê xwe girt û hemû nivîseran bi kirmancî dinivîst, ji ber hindê ez dibêjim çî tirs li ser kirmanciyê nîne, ev gotinên dihêne gotin dengên kizin û werarê nakin. Her çende neyarên xwe hene, belê ez dibêjim ya ji destê wan derketî û kirmancî dê her bimîne zarekê serekî yê zimanê kurdî.

Li bîra min e li sala 1959-1960-ê kovara "Ronahî" Hafîz Qazî bi kirmancî li Bexda derdêxist û xwendevan û nivîserê xwe hebû.

**Asîhî:** Çî tişte te pitir bi jiyane ve girêdide?

**Kerîm Findî:** Xwendin, û nivîsîn pitir min bi jiyane ve girêdidin û her wextekê min ne şîya xwendinê yan nivîsînê bikim ez dibînim...

**Asîhî:** Heger tu li Kurdistanê dewlemendekî kême şewe bay da çî bikî?

**Kerîm Findî:** Ez ne dewlemendekî kême şewe me...

**Asîhî:** Malî ava

**Kerîm Findî:** Gelek bi xêr hatin.

Ev dîdar bi tîpên erebî di kovara Peyv de belav bûye



Ebdulkerîm Findî, Dr. Hemîd Bavî

Foto: Guhdar Selaheddîn



Ebdulkerîm Findî, Kerîm Biyanî

Foto: Guhdar Selaheddîn



Foto: Guhdar Selaheddîn